# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (228) | Îlon / 1-9-2022


# «Vegera Pêwendiyên Tirkiyê û rejîma Esed bandoreke nerênî li xelkê Sûriyê dike»




Kurdistan

Rûsiya bi hemû hêza xwe dixwaze, Pêwendiyên Tirkiyê û rejîma Beşar Esed xweş bibin, û hewlên wê di vê derbarê de berdewam in. Lê Amerîka naxwaze dewlet pêwendiyên xwe ligel rejîma Beşar Esed baş bikin, û egera wê yekê heye wan welatan siza bide ewên pêwendiyên xwe ligel Esed baş dikin. Helbet opozîsyona Sûriyê jî niha di rewşeke xerab de ye, û ketiye nava du agiran de, ew jî naxwaze Tirkiyê pêwendiyên xwe ligel Esed xweş bike, ji ber ku ew dizane bi başbûna pêwendiyan, dê rewşa wê tevlihev bibe, û eger heye Tirkiyê piştevaniya xwe ji bo wê rawestîne, tevî ku serkirdeyên opozîsyonê vê yekê red dikin. Li aliyekî din, deverên opozîsyonê ji vê yekê nerazî ne, û xelkê wan deveran dibêjin dê prosês bandoreke nerênî li wan bike, û wê jiyana wan bikeve jêr metirsiyê de.

## Koma Orkêş ji bo aheng û festîvalan amade ye

Hêvî Delî

Berpirsa Şaxê Qamişlo ya Ofîsa çalakiyan Darîn Hemo ji Rojnameya Kurdistan re got: Em wek Yekîtiya Xwendevan û Ciwanên Demoqratî Kurdistanî - Rojava piştgirî û piştevaniya ciwanan dikin bi taybet di warê hunerî de, û derfetê didin keç û xortan yên xwedan behremendiyên taybet di hunerê de û piştevaniya pêwîst pêşkêşî wan dikin. Yek ji wan kar û xizmetan avakirina Koma Orkêş bû, ku ji bilî zehmetiyên dikşîne ew timî di amadebaşiyê de ye, û roleke xwe ya giring û sereke di kar û xebata Yekîtiya Xwendevanan de dilîze, û herdem xwe amade dike ku di aheng û çalakiyan de beşdar be, wek çalakiyên Yekîtiyê û ahenga Newrozê û yên netewî.


Rûpel—4

## Sedemên koça ciwanan ji Kurdistana Sûriyê

Rêzan Elî

Di dema dawî koça ciwanan ber bi welatên Ewropa gelekî zêde bûye, û piraniya ew kesên li ser vê mijarê diaxivin sedema vê diyardê jî ji bo rewşa abûrî û ewlekariya xerab vedgerînin.Welatiyek dibêje: Niha rewş ji ber kiryarên PYD û rewşa xeraba abûrî û nebûna xizmetguzariyan hatiye guhertin, li cem in jiyana min û ya zarokên min ji her tiştekî giringtir e, ezê derkevim derveyî welat û biçme Ewropayê, ti kes û aliyekî nikare rêgiriyê li xelkê bike ji ber ku ew mafdar in.

Rûpel—2


پارتی دێموکراتی کوردستان -سوریا
الحزب الديمقراطي الكوردستاني-سوريا
PARTIYA DEMUQRATA KURDISTAN-SÛRIYA

03 AR 02 KU 01 کوردی

**Birayên hêja li Serkirdayetiya Partiya Demokrata Kurdistana Îranê, kadir,Pêşmerge û cemawerê partiyê..**

Wek Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya me nûçeya yekgirtina partiya we bi kêf û coşeke zêde bihîst, em xebat û qurbanîdana we li dijî rejîmên Îranî bilind dinirxînin ji destpêka damezirandina partiya we di sala 1945an û heta niha.
Bi vê yekgirtinê, partiya bira hêz û baweriya cemawerên xwe vegerand, û xweşî xiste giyanên serkirdeyên Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, herwiha giyanê damezrênerê Komara Kurdistan Şehîd Qazî Mihemed, û hemû şehîdên partiyê.

Birayên hêja..
Pîrozbahiyên xwe ji bo kar û xebatên we derbarê pêkanîna vê yekgirtinê dubare dikin, û silav û rêzgirtinên me yên taybet ji bo herdu birêz Mistefa Hicrî û Xalid Ezîzî hene ku roleke wan ya mezin di vê yekgirtinê de hebû.

**Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya**
**22-8-2022**

# Koça ciwanan ber bi Ewropa ve zêde bûye

Rêzan Elî-Kurdistan

Koçberbûna ciwanan ji Kurdistan Sûriyê, ber bi Ewropayê ve berdewam e û roj bo roj nîşanên vê diyardeyê eşkere têne dîtin, ku ji serê her çend malan ciwanek koçberî derve bûye, û endamên malbatê yên mayî jî dixwazin derkevin û wek ew dibêjin ji vê jiyana ku têde dijîn rizgar bibin.

Li ser pirsa koçberbûna ciwanan ji Kurdistana Sûriyê nerîna hejmareke ciwanan wergirt.Hisên temenê wî 40 sal e dibêje”Ez yek ji wan kesan bûm li dijî hizra derketina derveyî welat bûm, lê niha nerîna min hatiye guhertin ji ber ku ez dibînim rewşa abûrî xerabtir dibe, û her roj em dibêjin xwezî bi doh, ne kehrebe, ne av, ne xizmetguzarî, jibilî vê yekê jî rewşa ewlekarî gelekî xerab bûye, berdewam Tirkiye bi dronan deverên me bombebaran dike, û ev yek jî metirsiyeke mezin e li ser jiyana welatiyan”.

Welatiyekî din jî dibêje”Leşkeriya neçar ya PYD û kiryarên revandina zarokan dibin sedem ku malbata Kurd zarokên xwe birevîne derveyî Kurdistana Sûriyê, heta ku di rewşeke xweş û dûrî şer û aloziyan jiyana xwe derbas bikin, berê piraniya xelkê digot emê bi xaka xwe girêdayî bin, lê niha rewş ji ber kiryarên PYD û rewşa xeraba abûrî û nebûna xizmetguzariyan hatiye guhertin, li cem in jiyana min û ya zarokên min ji her tiştekî giringtir e, piraniya berpirsên rêveberiya PYD zarokên xwe derxistin ji derve û tenê zarokên feqîr û hejmaran li welat mane, û ew jî bi darê zorê ji bo leşekeriya têne birin, ma gelo ev dadwerî ye, niha tu devê kê vedike, dibêje ezê derkevim derveyî welat û biçme Ewropayê, ti kes û aliyekî nikare rêgiriyê li xelkê bike ji ber ku ew mafdar in ku li pey jiyaneke xweştir û geştir bigerin.”

## Zêdebûna reva bi rêya sînoran

Di çend mehên derbasûyî de, rêjeya qaçaxçîtiyê ji parêzgeha Hesekê berev sînorê Tirkiyê zêde bûye ku ji wir jî dixwazin derbasî welatên Ewropayê bibin ji bo dîtin jiyana xweş. Li gor hatiye belavkirin di vê dema dawî de, hejmareke ciwanan dixwestin derbasî



Tirkiyê bibin, lê ji aliyê hêzên PYD ve hatine girtin û sizadan, hin jî ji aliyê grûpên çekdar ve li Serêkaniyê Girêsipî hatine girtin û ji bo berdana wan pere hatine xwestin. Di vê dema dawî de qaçaxçî welatiyên ku bixwazin derbasî Tikriyê bibin wan di sînor ji Dirbêsiyê heta bi Dêrikê derbas dikin, tevî hebûna



metirsiyan li ser sînor. Qaçaxçî rêyên nû dîtine, û tê xuyakirin jî Tirkiyê dixwaze pêleke koçberiyê li deverên me rû bide heta ku devera me vala bibe.

## Metirsî û nirxekî buha

Li gor tê belavkirin, û xelk jî dibêjin, qaçaxçiyên xelkê derdixin derveyî Kurdistana Sûriyê heta Ewrpa di navbera 10 heta 15 hezar Dolaran û li ser çend caran ev pere tê dan, tenê ewê derdikeve heta Tikriyê ji hezar heta du hezar Dolaran dide. Welatiyekî ji Rojnameya Kurdistan re got: Her ku metirsiyên rê kêm bin qaçaxçî pereyan zêdetir distîne, niha rêyên deryayê erzantir in, lê metirsiya wê gelekî zêde ye, tevî vê yekê jî xelk xwe li van rêyan dixin û ew û sense xwe ne, piraniya yên ku koç dikin temenê wan di navbera 18 heta 25 salan de ye, û ew dixwazin ji gundên Hesekê derbasî Tirkiyê bibin, lê metirsiya rê gelekî zêde ye, lê ew naxwazin biçin deverên ku grûpên çekdar lê hene.

## Firotina mal û milk

Di dema dawî, welatî ji bo dabînkirina pereyên derxistina zarokên xwe yan deyn dikin, yan jî mal û xaniyên xwe difroşin, û hin ji wan bi nirxekî erzan jî difroşin. Welatiyek dibêje, ji bo peydakirina jiyaneke xweş ji zarokên xwe re ew amade ye her milkekî xwe bifroşe. Li gor wî welatî ew dixwaze zarokên xwe ji vê jiyana xerab rizgar bike, û wan dûrî şer û aloziyan bibe. Nebûna xizmetguzariyên pêwîst ji av û kehrebeyê û xwendineke baş, dihêle ku xelkê Kurdistana Sûriyê zêdetir koçber bibin û berev welatên Ewropayê ve biçin.

# Pêwîstî bi Encûmeneke çalak û aktîv heye

Kurdistan

Encûmena Niştimaniya Kurdî li Sûriyê ENKS amadekariyên lidarxistina çaremîn kongreya xwe ya giştî dike. Tê pêşbînîkirin di demeke nêzîk de kongire bê lidarxistin. Bi nêzîkbûna lidarxistina çaremîn Kongreya ENKS daxwazên guhertin û çaksaziyên tên kirin.

> Çaksazî di nava ENKS de giring e

Rojnameya Kurdistan di vê derbarê de xwest nerîna welatiyan li ser Encûmena Niştimaniya Kurdî li Sûriyê ENKS û karên wê li Kurdistana Sûriyê nas bike. Sîham Mihemed wiha di vê derbarê de dibêje, Encûmena Niştimaniya Kurdî li Sûriyê nûneratiya beşekî zêde ji xelkê Kurdistana Sûriyê dike û ji dema damezirandina wê û heta niha xelk ligel wê ne tevî ku di gelek astengiyan re derbas bû, rastî kiryarên xerab yên hêzên çekdar yên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve hat, berdewam nivîsîngehên ENKS li hejmareke bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê hatine şewtandin, endam û alîgirên wê hatine revandin û girtin,

> Nabe ENKS cemawerên xwe piştguh bike

tevî van hemû tiştan jî ENKS berdewam bû di karên xwe de, lê ev yek nayê wê wateyê ENKS kar û xebat û alîgir û xelkê xwe piştguh bike, û pêwîste di vî kongreyî de çaksazî werin kirin û biryarên bihêz werin standin, heta ku ENKS ji vê sarbûnê rizgar bike, ENKS take hêviya gelê Kurdistana Sûriyê ye, ji ber ku tenê ew daxwaza doz û mafên rewa yên gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê dike.

> Kongreya Çaremîn xala guhertinê ye

Beşîr jî wiha li ser vê mijarê dibêje,ENKS pêwîste xwe ji wê çarçoveya berya niha derxîne, û xwe ligel pêşhat û rewşa nû ya Sûriyê biguncî ne, heta ku bikaribe rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê baş bike, û bi cidî tevlî karê siyasî bi giştî li Sûriyê bibe, ji ber ku çaksaziyê neke dê bibe laşekî mirî, û dê hino hino jinav biçe. Ebdula Ehmed jî dibêje, pêwîste beşdariya xort û jinan zêde be, heta ku ENKS bikaribe tevahiya tex û çînên civakê li xwe bigre û nêzîkî xwe bike, da ku bikaribe çalakiyên zêde bike, û hewil bide xwe ji vê sariya niha têde ye rizgar bike. Welatiyekî din jî dibêje, xelekekî zêde piştevaniya Encûmena Niştimaniya Kurdî li Sûriyê ENKS dikin, ew jî ji ber ku ENKS daxwaza mafên rewa yên gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê dike, û ev yek jî dihêle ku cemawerên wê zêde bin, lewma pêwîste ENKS dest ji alîgir û cemawerên xwe bernede, herwiha dest ji mafên rewa yên xelkê Kurdistana Sûriyê bernede. Pêwîstiya Kurdistana Sûriyê bi Encûmeneke çalak û aktîv heye heta ku bikaribe xwe ligel rewşê biguncîne.




# Enfal birîneke kûr di dîroka gelê Kurdistanê de

Kurdistan

Di 25ê Tebaxa 1988an de, di dirêjahiya zincîreya tawanên rêjîma Iraqê li dijî gelê Kurdistanê de, beşeke mezin a navçe û gundên devera Badînanê ketin ber hilmeta nemirovane ya kîmyabaran, girtin, kuştin, raguhastin û enfalkirina welatiyên bêtawan ji aliyê hêzên rêjîma berê ya Iraqê ya rûxandî. Enfala Badînanê, qonaxa dawî ya Enfalê bû, rejîma Iraqê weke hemû navçeyên din ên Kurdistanê, tawaneke din a hovane li hember gelê devera Badînan kir ku di encama hemleya ku çekê qedexekirî tê de hat bikaranîn de bi hezaran kes hatin şehîd û wendakirin û bi deh hezaran kes jî koçber û derbider bûne û bi sedan gund wêran bûn. Serok Mesûd Barzanî di salvegera tawanên Enfala Badînanê de peyamek belav kir û tê de ragihand, “Gelê ti carî zimanê zordarî û tawanê qebûl nake û divê dewleta Iraqê qerebûya wan hemû tawan û stemkariyên li dijî miletê me hatine kirin, bide.”Herwiha Serok Barzanî ragihand, Armanca rêjîmê ji vê kiryara şovenist û vê tawana mezin, guhartina demografiya Kurdistanê, şikandina vîna gelê Kurdistanê bi riya çek û zordariyê bû, lê belê vîna gelê Kurdistanê ya mayîn û azadîxwaziyê bi ser ket û ew dijmin, neyar û tawanbar ketin zibildana dîrokê. Di bîranîna sî û çar saliya tawana enfala Badînanê de, silav li giyanê pak ê şehîdên komkujiya Kurdên Feylî, enfala Badînan, Germiyan, Barzan û hemû şehîdên riya azadiya Kurdistanê. Di vê bîranîna diltezîn de radigihînin ku gelê ti carî zimanê zordarî û tawanê qebûl nake û divê dewleta Iraqê qerebûya wan hemû tawan û stemkariyên li dijî miletê me hatine kirin bide.



# Koma Orkêş.. Dibistaneke hunera Kurdî

Hêvî Delî-Qamişlo



Yekîtiya Xwendevan û Ciwanan ji dema damezirandinê di sala 2013an û ta niha di kar û xebata xwe de berdewam e, ji bilî hemû astengiyên têde derbas dibin li Kurdistana Sûriyê, yekîtî bi erk û rola xwe di lidarxistina çalakiyên cor bi cor, herwiha beşdarbûna wê di aheng û festîvalan de roleke wê ya bingehîn û berçav hebû, û ev yek jî bi hebûna Koma Orkêş ya filoklorî.

> **Koma Orkêş, sala 2016an hatiye damezirandin**

Koma Orkêş yek ji komên huner û çand û filiklora Kurdî ye, di sala 2016an, ji aliyê Şaxê Qamişlo yê Yekîtiya Xwendevan û Ciwanên Demoqratî Kurdistanî - Rojava ve hate avakirin, bi sê beşên xwe yên sereke (Şano,Stran,Dîlan) ku dibistaneke hunerî û Kurdayetiye ser rêya Barzaniyê nemir, û li ser dikeya şanoyan xebata xwe dike, ew bi gotina stranên Netewî û pêşkêşkirina dîlanên filiklorî, herwiha bi serpirştiya ofîsa çalakiyan karê xwe bi rêve dibe.
Rojnameya Kurdistan xwest bêhtir zanyariyan li ser vê komê û kar û çalakiyên wê nas bike, ji ber vê yekê jî Berpirsa Şaxê Qamişlo ya Ofîsa çalakiyan Darîn Hemo ji Rojnameya Kurdistan re got: “Em wek Yekîtiya Xwendevan û Ciwanên Demoqratî Kurdistanî - Rojava piştgirî û piştevaniya ciwanan dikin

> **Piştevaniya ciwanan armanca Koma Orkêş e**

bi taybet di warê hunerî de, û derfetê didin keç û xortan yên xwedan behremendiyên taybet di hunerê de û piştevaniya pêwîst pêşkêşî wan dikin. Yek ji wan kar û xizmetan avakirina Koma Orkêş bû, ku ji bilî zehmetiyên dikşîne ew timî di amadebaşiyê de ye, û roleke xwe ya giring û sereke di  kar û xebata Yekîtiya Xwendevanan de dilîze, û herdem xwe amade dike ku di aheng û çalakiyan de beşdar be, wek çalakiyên Yekîtiyê û ahenga Newrozê  û yên netewî”.
Berpirsa Şaxê Qamişlo ya Ofîsa çalakiyan Darîn Hemo wiha berdewam kir û got: “Niha bi helkefta nêzîkbûna roja damezirandina Yekîtiya Xwendevan û Ciwanên Demoqratî Kurdistanî – Rojava, Koma Orkêş bi sê beşên xwe ve ji bo lidarxistina aheng û şahiyan xwe amade dike.
Darîn Hemo di dawiyê de anî ziman, armanc ji avakirina vê komê, rêxistina ciwanan  e, herwiha karekî balkêş pêşkêşî nifşê nû dikin û wan fêrî hunera Kurdî dikin.
Ji aliyê xwe ve, Rahênerê Beşê Dîlanan Mihemed El-Elo ji Rojnameya Kurdistan re got: “Ev sê sal in serpirştiya Koma Orkêş dikim di warê dîlanan de,ku bi du beşên xwe ve ku ji ya mazin û biçûkan pêk tê û hînî dîlanên filiklora Kurdî dibin”.

> **Koça ciwanan bandor li karê komê kiriye**

Wî rahênerî behsa zehmetî û astengiyên têne pêşiya karê komê kir û got: “Kêmbûna endaman vedgere sedema koçbarkirina keç û xortan ji Kurdistana Sûriyê, û ev yek bandorê li ser kar û xebata koma me dike”. Herwiha Elo got, Pirovatên komê hertim berdewam in ji bo ku ew ji aheng yan festîval yan her çalakiyek be amade bin, û rastî astengiyan nebin.  Îman Hemê yek ji endamên herî kevin di komê de  ye ji Rojnameya Kurdistan re wiha got: Bi viyaneke bihêz ji hunerê re tevlî nava refên komê bûm ji destpêka damezirandina wê, û ligel hevalên xwe li ser dikeya şanoyan bi dilekî germ xweştirîn stranên netewî û evînî û dîlanên filiklorî bi rengê jiyanê pêşkêş dikin bi mebesta geşkirin û xurtkirina moralên milet û guhdaran. Hêja ye were gotin, Yekîtiya Xwendevan û Ciwanên Demoqratî Kurdistanî – Rojava rêxistineke niştîmanî û Demoqratî ye, piştgirî û piştevaniya ciwanan dike ji bo xwestek û dozên wan cîbicî bikin û parastina mafên wan di hemû waran de jî bike, û Yekîtî bi karekî Kurdewarî radibe di xizmeta mafê Xwendevan û ciwanan de di warê siyasî, çandî û civakî de, herwiha di warê belavkirina çand û hişmendî ji bo raman û hizra netewî di nav ciwanan de geştir bike.

